

Sîgorteyeka nexweşan ji her kesî re

HEGER DI
TEDAWIYÊ
DE ZIYANEK
LI TE BIBE

—

LÖF



HEGER DI TEDAWIYÊ DE ZIYANEK LI TE BIBE

Heger tu di tedawiyê de tûşî ziyaneke bibî, mafê te yê tezmînatê li gor qanûna ziyane nexweşan heye. Hemû wîlayet û herêmên Swêdê sîgorteya nexweşan li bal Löv (Landstingens Ömsesidiga Försäkringsbolag - Şirketa sîgorteyê ya hevbeş ya wîlayetan) îmze kirîye. Her salê zêdetir ji 16 000 ziyane nexweşan li bal Lövê tên gilî kirin. Tezmînat ji bo nêzîkî 40% ji ziyane gilîkirî tên dan.

Ev broşur agahdariyên hêskirî li ser sîgorteya nexweşan dide te. Hemû lêkolîn û nirxandin li gor qanûnên heyî û şertên sîgorteyê yê karpêkirî tên kirin.

Ziyane ku heta 2014-12-31 qewimîne:

Divê tu di nava **sê** salan de agahiya ziyane bidî gava tu dizanî ku

- ziyane bi aşkirayî diyar e
- têkiliya ziyane bi tedawiyê ve heye û tezmînata ziyane nexweşan mimkin e
- daxwaza tezmînatê ji kîjan sîgortedêre re tê raber kirin.

Deh sal ji dema ku ziyane qewimiye sinorê midetê yê herî dirêj e.

Ziyane ku heta 2015-01-01 qewimîne:

Divê tu di nava **deh** salan de ji dema ku ziyane qewimiye agahiya ziyane bidî.

SÎGORTE JI BO ÇI DIBE?

Heger îmkana ziyannekirinê hebûya

Divê îmkana hebûbe ku ziyana neyê kirin da ku tezmî-nata wê bê dan. Rîskên komplîkasyonan yê ku îmkana rêlibergirtina wan nîne di hemû tedawiyên lînêrîna nexweşan û ya didanan de hene. Tezmînat ji bo komplîkasyonên weha nayê dan.

Ziyana ji ber alavan

Mafê te yê tezmînatê dikare hebe heger ziyana te ji ber şaşiyekê yan şaşbikaranînê ya cîhaz, alav yan navgînên alîkar yê din yê ku di lînêrîna nexweşan yan didan de tîn bi kar anîn qewimibe.

Teşxîsa şaş yan derengmayî

Tu dikarî tezmînatê bistînî heger teşxîs dereng mabe û heger tu ji ber derengmayînê nexweştir bûbî.

Enfeksiyon

Rîska enfeksiyonan her dem di emeliyatan de heye. Têzmînat dikare bê dan heger madeya nexweşîhilgir di dema lînêrîn û tedawiyê de hatibe veguhastin. Lê tezmînat nayê dan heger enfeksiyon ji ber bakteriyên te bi xwe çêbûbe yan tu ji ber rewşeka jiyankuj hatibûyî tedawî kirin.

Qeza

Tezmînat dikare bê dan heger ziyana ji ber qezayekê be ya ku bi lînêrîna nexweşan yan didan têkildar be, di dema guhastina nexweşan de be yan bi sedema zere-reka avahiyên lînêrîngehê yan alavekê be. Heger tu bo nimûne di rêya tiwaletê yan cihên wek wê de bilikumî, normal tu ti tezmînatê nastînî.

Dermandana şaş

Mafê te yê tezmînatê dikare hebe heger ziyana ji ber ku dermanek bi şaşî hatiye tewsiye kirin qewimibe. Gilîkirina êşên ku ji wan dermanan çê dibin yê bi diristî hatine tewsiye kirin li bal Sîgorteya dermanan tê daxwaz kirin.

SÎGORTE JI BO ÇI NABE?

Ziyana trafîkê û ziyana karî

Heger tu tûşî ziyaneke trafîkê bibî, normal sîgorteya trafîkê tezmînata wan ziyanan dide yê ku ji ber tedawîkirina ziyana trafîkê peyda bûne. Di halê ziyana karî de, tu dê pêş her tiştî pêwendiyê bi Sîgorteya AFA û TFA (Trygghetsförsäkring vid arbetskada - Sîgorteya ewlehiyê di halê ziyana karî de) bikî.

Lênêrîna şexsî

Doktor û doktorên didanan yê ku şexsî kar dikin û li gel lîênêrîna wîlayetê, herêmê û belediyeyê ne xwedî peymanê lîênêrînê ne sîgorteya nexweşan li şîrketên din yê sîgorteyê îmze kiriye. Tu dikarî agahdariyan ji lîênêrê xwe werbigirî heger tu ne piştrast bî ka tu dê peywendiyê bi kîjan şîrketa sîgorteyê bikî.

Ziyana tiştan

Sîgorteya nexweşan tezmînatê ji bo xesaretkirina tiştên şexsî nade, wek nimûne, ku berçavkên te şkestibin, cizdana te hatibe dizîn yan taximê didanên te wînda bûbin.

Pûtedan yan îmkan

Pirsên girêdayî bo nimûne pûtedan yan îmkanan di lîênêrîna nexweşan û didanan de nakevin nava sîgorteya nexweşan. Tu dikarî behsa wan pirsan li gel komîsyona nexweşan yan pêbaweran ya wîlayetê yan herêmê bikî.

Jİ LÊNÊRÎNÊ NE RAZÎ YÎ

Gelo, bûyereka lîênêrînê tu xemgîn, hêrs yan xeyalşkestî kiriyî? Hingê tu dê pêwendiyê bi komîsyona nexweşan yan pêbaweran ya ku li her wîlayet û herêmê heye bikî. Komîsyonên nexweşan xebatên bêalî ne yê ku tîkiliyên navbera nexweş û lîênêran hêsan dikin. Di www.1177.se de, zêdetir bixwîne.

Qisûrên di ewlehiya nexweşan de: Heger te qisûr di ewlehiya nexweşan de di lîênêrînan yan tedawiya di lîênêrîna saxlemî û nexweşan yan lîênêrîna didanan de dîtîbin, tu dikarî giliyê li bal IVO (Inspektionen för vård och omsorg - Mifetişiya lîênêrînan û sexbêriyê) bikî. IVO daîreyeka dewletê ye û li bin destê hikûmetê (Wezareta karûbarên civakî) ye.

Di www.ivo.se de, zêdetir bixwîne.

SÎGORTEYA NEXWEŞAN BI KURTÎ

Tu dikarî tezmînatê bistînî

- ji bo zîyanên ku îmkana neqewimîna wan hebûye
- ji bo zîyanên ku ji ber şaşî yan şaşbikaranînê ya berhemê tibî yan alavê lînêrînê qewimîne
- ji bo zîyanên ku ji ber teşxîsa şaş yan derengmayî qewimîne
- heger madeya nexweşihilgir di dema tedawiyê de hatibe veguhastin û bûbe sebebê enfeksiyonê
- ji bo hin zîyanên qezakirinê
- ji bo zîyanên ku ji ber dermankirina şaş qewimîne


Tu tezmînatê nastînî

- heger giliya zîyanê dereng hatibe kirin
- ji bo xesaretkirina tiştên şexsî
- ji bo zîyan û komplîkasyonên ku îmkana neqewimîna wan tine bû
- heger enfeksiyonek ji ber bakteriyên te bi xwe çêbûbe yan heger nexweşiya ku tu ji ber wê hatibûyî tedawî kirin ji enfeksiyonê bitalûketir bû
- heger êşan ji ber dermanî yê ku bi diristî hatibûbe tewsiye kirin tu girtibî
- ji bo zîyanên ku ji ber tedawiya dirist ya rewşeka jiyankuj ya dîrekt peyda bûbin

GILÎKIRINA ZIYANEKÊ

Tu bi xwe biryarê didî ka tu giliyê li bal me bikî yan ne. Tu dikarî di malpera me, www.lof.se, de bi rêya Bankldê biçî nav Mina sidor (Rûpelên min) û agahdariyên xwe dagirî û giliya xwe qeyd bikî.

Tu dikarî formeka gilîkirinê ji malpera me dakişînî. Ew form li nexweşxane, navendên lînêrînê û klînîkên lînêrîna didanan jî heye. Herweha, tu dikarî wê ji komîsyona xwe ya nexweşan yan pêbaweran bixwazî yan telefona sentrala me 08-551 010 00 bikî.



Li gor qanûna zîyanên nexweşan, mafê te yê tezmînatê heye heger tu di lînêrînê de tûşî zîyanekê bibî. Ev broşur agahdariyên hêsan-kirî li ser sîgorteya me ya nexweşan dide te.

Ji bo agahdariyên zêdetir, serdana malpera me www.lof.se bike.

Löf
Box 17830
118 94 Stockholm

Sentral 08-551 010 00
Faks 08-551 011 90
info@lof.se
www.lof.se